

*dabaş*

## NASNAMEYA RÛMETÎ

Nasnameyên gelên bindest her dem bûne asteng, yan jî bûne pîrsgirêk di jiyana komên xelkê de. Weke tê zanîn, nasname ne yek dudu ne. Her war û şaxê rûmetî û bi hêz taybetiyek nasnameyî ye. Çi çandî be, çi polîtîkî be... Heger di vê pêkhatinê de daxûyaniyek ramangîrî di hêla parastinê de hebe û xwe bide erêkirin. Bê goman rojnamegerî yek ji van karê bi rûmetî ramangîrî di hêla parastina mafê komên xelkê de ye. Mixabin Kurd di vê hêlê de jî di destpêkê de ne. Ev destpêk bi destpêka şoreşa Kurdî de pêkhatiyê heya ro jî bedelên pîr mezin, giranbiha dane. Hê jî dide. Semînera Mazhar Günbat jî di vê hêlê de balkêş bû ku ne bes di dîroka rojnamegeriya Kurdî ya qutibir, misrî û çilmisî de bû, bi giranî li ser dîroka rojnamegeriyê û bandora vê di hêla 'rêvebirina mirovan' de û rastmaliya neteweyî ku di pêşketin û gihandina qonaxa îro de rol leyistiye. Em ji sedî sed tevî vê dîtinê dibin ku rojekê berî rojekê rastmaliya Kurdî destên xwe biavêjê vê hêla girîng ku di hêla bazirganî de û bandora ramanî de jî xwedî hêz e. Her tişt nemîne bendeyî rêxistin û saziyan. Heger rastmal têkevê vî karê karbidestî (pîşesazî) de, bêgoman serbestî û azadiya rojname û rojnamevanan jî derdikeve meydanê. Bila destûr, yan jî zagonên dewletî nebin asteng. Ji ber ku rojnamegeriyê zagon û destûrên xwe bi xwe avakirine û bi komên xelkê, yan jî bi dewletan dane qebûl kirin. Ew objektîvîzma ku li gorî derfên dem û cih têne guhertin jî pîrrianiya caran nayên ber çavan. Mijulayiya koman di çavan de ye, (ku dîmenên bi reng û spotên kapîtalî yên reşik vê rê nadin) heya bûyer û ragihandin têkevin şirovekirinê û bête diyar kirin 'hasil digihe Musil'. Lewra, dive ku rastmaliya neteweyî ya Kurdî vê hêzê di xwe de bibîne, ku dikaribe têkevê qonaxa hemdemî û navneteweyî de.

Medenî FERHO

MAZHAR GÜN BAT  
LI SER ROJNAMEGERIYÊ

Li Enstîtuya Kurdî ya Brukselê li ser rojname û rojnamegeriya Kurdî, 10 semîner, (çi teknîkî be çi karbendî be,) têne amade kirin. Di 3. 7. 1996 de ji teref **Mazhar Günbat**, ku berpirsiyarê rojnameya **Welatê Me** bû, hate amade kirin. Dabaşa yekemîn li ser dîroka rojnamegeriya cîhanê û têkiliyên rojnamegeriyê bi hêlên din re, rojnamegerî û polîtîka, rêzimana rojnamegeriyê û hwd. bû. **Mazhar Günbat**, di destpêka axaftina xwe de li ser sazî û dezgehên neteweyî ku pêwîst e balê berdî ser pîrsgirêkên girîng ku di tevgera civakî de stûnên jiyana û xwedanhevê ne û pîrsek kir û bersiva wê da: 'Gelo çima li saziyek weha li ser rojnamegeriya Kurdî semîner bête dayin?' Bersiva vê pîrsê jî, bi pîrsa ku bi taybetî di pîşegeriyek jiyana de di nava komên xelkê de cihê xwe girtiye. Dema ku em bi berçavikên modern li rojnamegeriyê binêrin, hingî em dê girîngî û balkêşiya van semînerên ku li vir bêne dayin bibînin û fam bikin. Ji ber ku tarîfa her karê ku mirov bi xwehdana xwe li ser tarîfên xwedî gotin û ramangîrên rojnamegeriya rojnamevanî raweste wê bibîne ku karê perwerdekirin, ragihandin, manîpula mirovan (rêvebirina mirovan endîrekt) tê de heye. Lewra jî karê rojnamegeriyê ji teref hinek kesan ve 'rojnamegerî siyaseta çîneya serdest ya endîrekt e.' tê tarîf kirin. **Mazhar Günbat**, ev mijara girîng ku di tevgera mirovan de û di jiyana pêşerojan de pîr girînge hinekî din bi mînak û bûyerên dîrokî anîne ziman. Piştî wê bal kişande ser tarîfa bîngehîn ku 'ragihandin e' û got ku 'mîrovaniyê ev kar di encameke pîr fereh, mezin û xwedî bandor de pêkaniye.'

**Mazhar Günbat** paş tarîf û nasandina rojnamegeriyê li ser dîrokê û ji sedsala 14 an de ku vî karî bi nameya dest pê kiriye û di nava komên xelkê de hatiye kirin axaft. Helbet ev jî destpêka rojnamegeriya modern e, yanî dema avabûna bazirganiya burjuwazî ye ku bank ava dibin û bulten têne derxistin. Got ku: 'Di sala 1605 /1609 an de rojnameyên heftiyî, kovarên 15 rojane di nava çîna rastmalî de dest pê kirine. Ev dema erka emperetoriyan e û erka navendî ku ketiye rêkûpêkiyê de ye.'

**Mazhar Günbat**, bal kişand e ser rola rojnamegeriyê di hêla pêşveçûna şaxên zanistî, ku bi vê destpêkê re matematîk, biyolojî, fîzîk, kîmya, astrolojî, dîrok, coğrafya rekih şikandin û ji nava gevzoneka tengasiyên xwe derketin, ketin nava komên xelkê de. Piştî vê ragihandinê, semînerdar li ser xwendin û nivîsandina zêde ku di zêdebûn û destpêka bi xurtî derketina rojnameyan re rawestiya û got ku 'şikandina rekiha warên zanistî dest pê kir.'

**Mazhar Günbat**, dabaş anî ser pêşketin û ferehbûna ku binavê şoreşa karbidestî (pîşesazî) li Îngîlistanê tê binavkirin, bandorek pîr mezin û xurt li ser rojnamegeriyê kiriye û ev şax ketiye warê navneteweyî de. Û got: 'Hingî rastmalî dikeve dewsa erka emperetori de. Helbet ev jî bû sedema destavêtina rojname û rojnamegeriyê.' Wilo hate diyar kirin ku bandora pêşî bi reklam û dîrekt bidestxistina rojnameyan giha encama destûrên xwedî bandor ku erkê de heye. Semînerdar, ev encam heya roja derketina computer ku bandora herî mezin li ser rojnamegeriyê kiriye anî ziman û got: 'Lewra jî ji bo pîşegeriya rojnamegeriyê pîr pîr fereh e, û bi her karî û her war û şaxî ve girêdayî ye. Helbet ev têkilî hêzeke mezin û xurt dide rojnamegeriyê.'

## ROJA ÇANDÎ YA NAVNETEWÊYÎ FLANDEREN WELATÊ ME YE JÎ'

Roja Şemiyê, 6.7.1996, li Zellik, nêzî Brukselê, şahiyê teybetî hate pîroz kirin. Ev şahî ji aliyê Enstituya Kurdî ya Brukselê, Rêxistina Navneteweyî ya Flaman û ABeCe-Noodhulp, bi alîkariya Wezaretê Çandê Ya Flamanî û Navenda Çandê ya Navneteweyî ji bo Biyanîyan, hate amade kirin.

Sedema vê şahiyê cejna Flamanan ya 11ê Temûzê bû. Bi şêwr û alîkariya wezaretê Enstituyê xwest ku ev roj bibe nîşanek ji bo hevkarî û bînferehiya (solidarite û tolerans) di navbera civakên cihê de li vî welatî. Loma programa rojê pîr fereh û zengîn bû. Navneteweyî û pîrralî bû.

Ev cejn di salona şahredariya Zellik de bi programa zarokan dest pê kir. Komikên zarokan bi listikên ji Kurdistan, Flanderen, Ermenîstan û Gurcistan çend saet bihurandin. Paş re çend musabeqe di navbera jinan de çê bûn. Hedef ew bû ku ew xwarinên welatê xwe pêşkêş bikin. Lê mixabin! Xwarin ne hatin meydanê.

Hemî rojê berhemên hunermendên Kurd, Ermenî û Gurc hatin pêşandan. Resimên hêja salona vê cejnê dineqîşandin. Pirtûk û kasetên cihê jî ji bo mêhvanan amade bûn.

Paş saet 19 beşê duyemîn ya programê, muzîk, sitran, govend û şahiyê dest pê kir. Dengbêjên hêja, hunermendên qedirbilind Aslıka Qadir, Temo, Birader, Ronî, Canê û Şêrgo programa cejnê bi deng û muzîka xwe xweştir kir

in. Koma folklorê ya Enstituya Kurdî ya Brukselê jî bi listikên xwe ji navçeyên cihê ji Kurdistanê ev şahî hê zêdetir bi reng kir.

Derwêş M. Ferho li ser armanc û naveroka vê cejnê û sedema pîrozkirina wê ji aliyê Enstituyê, mamosteyê hêja Mustafa Düzgün li ser girîngiya hevkarî û hevalbendiya di navbera civakên cihê û kurdan de, nivîskarê Kurd Wezîrê Eşo li ser girîngiya perwerde kirina hesa (rûhiyeta) Kurdî di nav civaka me de û xaseten zarokên me Kurdan, berpîrsiyarê projeyên avakirinê li Kurdistan, Marcel Duchateau li ser xebat û armancên alîkariya rêxistina Navenda Navneteweyî ya Flamanî li Kurdistan û parlementerê Flamanî Sven Gatz jî li ser dîroka têkoşîna gelê Flaman ji bo mafên xwe yên bîngêhî û rola xebata ziman di vê têkoşînê de axaftin kirin.

Di navbera cejnê de jî tiştêkî teybetî hate amade kirin. Di destpêkê de her kesî vexwarineke pêşeke (aperetîfa Kroasya) stend, paş re şîş kebabeke Kurdî û weke şîranî jî xwarineke Flamanî û qehwe di ber re hate dayin.

Di salonê de merivên ji neteweyên cihê hebûn. Her kesî li gora dilê xwe list, sitra û şahî kir.

Rojnameyên bi navê Wij, Het Nieuwsblad û Het Volk li ser vê cejna teybetî ku ji aliyê Enstituyê hate amade kirin nivîsîn û pesnê xebata wê ya giranbiha di nava Beljîka de dikê dan. Hêvî ew e ku ev hevkarî di pêşerojê de xurttir bibe.

### PIRTÛK

#### KULTUR, HUNER û EDEBIYAT

'Gelî ronakbîrên kurd ên bi rûmet! Li xwe veşerin, xwe nas bikin, bi zimanê xwe tevbigerin! Li ser hîmê xwe rabin, li ser koka xwe geş bibin! Mîrov encex di nava mîletê xwe de serbilind e, di nava mîletê xwe de serbilind bibin! Biratiya bi gelên dinyayê re bi hebûna mirov dest pê dike, li hebûna xwe xwedî derkevin! Hebûna we zimanê we ye, kultura we ye, edebiyata we ye!'

Firat Cewerî bi vê gotina xwe ya hêja pirtûka xwe ya nuh, di rêza weşanan de ya 25ê, pêşkêşî ronakbîrên kurd dike.

Ji serî ta dawî pirtûk bi zimanekî xweş, zelal û şîrîn hatiye nivîsandin. Bi temamî ev berhema hêja ji 54 hevpeyvîn, bîranîn û xatiratên ronakbîrên Kurd pêk tê. Ev nivîs û hevpeyvînên di deh-panzdeh salên dawî de pêk hatine resimekî sed salane yê huner, kultur û edebî dide ber çavan. Ronakbîrên kurd ku nivîs, hevpeyvîn û bîranînên wan di vê berhemê de hatine weşandin ev in:

Celadet Alî Bedirxan, Mûsa Anter, Nûreddîn Zaza, Cegerxwîn, Osman Sebrî, Rewşen Bedirxan, Edîp Karahan, Tosinê Reşîd, Şerefxan Cizîrî, Nacî Kutlay, Şahîne Bekirê Soreklî, Rojen Barnas, Rohat Alakom, Hesenê Metê, Mahmud Baksî, Mehmed Uzun, Kendal Nezan, M. Elî, Derwêş M. Ferho, Remzî Bilget, Îkramettîn Oğuz, Hesenê Qazî, Kerîm Husamî, Mahmût Mola Ezat, Can Yücel, Vedat Türkalî, Arîf Damar, Ciwan Haco, Seîd Yusuf, Riza Topal, Edîp polat, Kemal Burkay, Şêrko Bêkes, Ferhad Shakely, M. Malmîsanîj, Havîz Qazî.

Di dawîya pirtûkê de jî 'çîroka jiyana' Firat Cewerî heye.

*Kultur, huner û edebiyat, Firat Cewerî, çapa yekem, 1996, Weşanên Nûdem, Termov. 52 - 176 76 Järfälla - Sweden, Tel. û Fax 00 46 8 583 564 68*

### ŞEVÊN ZIVISTANÎ û MELEKÎ TAWUS

Şano

Havîna vê salê pirtûkxana kurdî bi berhemeke nuh zengîntir bû. Abbas M. Abbas, pirtûkeke ji pênc şanoyan pêkhatiye bi pêşgotina Medenî Ferho pêşkêşî xwendevanan kir.

'Hêvî, cih û war e!... Kurteşanoyên Abbas M. Abbas li ser bîngêha coxrafya Mezopotamya hatina ava kirin. Ne kevin û mîtolojîk, dabaş û galgal, teva bi ramanên hemdemî, lê bi zimanekî hêsa ku di jiyana rojane de tê bikaranîn hatine nivîsandin.' ji pêşgotina Medenî Ferho.

Şanoyên di pirtûkê de, 'Şevên Zivistanî û Melekî Tawus', 'Kewê Koçber', 'Pêşmergê Biçûk', 'Cengo' û 'Xecê' ne.

#### Wekî din

Tarîxa Felsefeyê Ya Rojava (Qirna Antîk), Mustafa Düzgün yekemîn pirtûka li ser felsefeyê bi zimanê Kurdî ye. Lêkolîneke giranbiha ye. Weşanên Berhemê.

Hades Îş Başında, Medenî Ferho, bi Tirkî, berhemên salên wî yên girtîgehê ne. Roman li ser girtin, êşkence, bawerî û hêviyê hatiye nivîsîn. Weşanên Kora.

Şîrên Windabûyî, Cegerxwîn, Şîrên ku heta nuka nehatine weşandin di vê berhema nuh de li hev hatine kom kirin. Weşanên Avesta, 58 rûp.

Firat Marmara'ya Akar, Musa Anter, bi Tirkî, nivîsarên cihê yên Mûsa Anter di vê pirtûkê de hatine weşandin. Weşanên Avesta, 246 rûp.

Kurdistan Bi Fiftî Fiftî, Osman Aytar, hevpeyvînên bi berpîrsiyarên partiyên siyasî yên başûr û birêvebirên Hikûmeta Federe ya Kurdistanê, rewşa Kurdistana başûr radixe ber çavan. Weşanên Nûjen, 318 rûp.

Cembelî (Kurê Mîrê Hekaryan), Îhsan Cûlemêrgî, serpêhatiyên Cembelî, kurê Mîrê Hekaryan û Binefşa Narîn. Weşanên Apec, roman, 197 rûp.

PAYIZOK

Sêrgo

Payizok, yek ji celebên stranên herî kevin û bi wate ku di naveroka xwe de bûyerên trajîk diragire. Melodiya payizokan bi rîtmek giran û kûr e, wek rîtma girîna binalîn, lê bê qîrên... Payizok stranên demsala payîzî ne...  
Ew wergerandina dîmen, 'hîs', xweza, û 'xuy'ê mirovan e. Babetên payizokan evîn, dûrbûn, xerîbtî, mirin, xwîn û ahên e... Payizok pirranî li herema Botan tene bihîstin. Giyanên xwe ji çiya û latên cih distînin.  
**'Heyran Jaro...'** yek ji payizokên trajîk ku dengbêj **Ebdilezîzê Simê** strandiye...  
Ev payizok çîroka kuştina law, li ser destên dê bi şaşîti ye... Ew payizok bi wesfê rewşa dê û xweza dest pê dike. **'Jaro... Çiyayê Cudî sinsil e... Tanîna Sindiya...'** Cih û derdorê dê, ku stran li ser zimanê wê tê gotin tê raxistin, darî çav...  
Melodî, li destpêkê weke bangeke nerm, lê ku dûr here, bilind û berdewam dike, hêdî hêdî tê xwarê... Wek dagerîna ji çiyê...  
Deng giran dibe, westiyayî, bi kelogirî dibe û nizim û dawiya dramayê nêzik dibe, heya ku deng diçike, winda dibe. Ji roja ku payizok şin daye heya îro bê muzîk hatiye gotin. Bêhtirîn li nav koçeran tê bihîstin.  
Di payizokan de teknîkek pir bilind tê bikaranîn, ji bo deng. Serpêhatî û pêkanînen sedsalan pirrengî û delaliya hunandina ahengî derxistiye meydanê. Melodî bi xwe jî, pirr dewlemend û bi bandor e. Bandora wê ji dil û mêjî tê...  
Bi têhnika dil û têgihîştina mêjî ew hunandina ahengî di nava ra, tara û tarîşkên gerdena xas de bandora xwe dike. Helbet ev bandor car din li guh û dil û mêjî dibe. Tê de livandinên ahengî, çep, jor, nizim, rast, bilind û giran peyda dibin...  
Payizok, hunerek pirralî ye di warê babet, awaz û teknîka xwe de. Hunereke Kurdî ye, bê hampa ye û durî hemî bandorên biyanî ye... Û cihê şan û rûmetê ye... Ew nişana hunermendiyek aloz ya neteweya Kurd e... Ku weke her hêlî, xelkê Kurd jiyana xwe ya têr qerqesûn û tevlihev bi zimanê xwe yê zikmakî, di encamek pirr xurt û dewlemend de ava kiriye.  
Derd û kul û êşa dilê xwe, çî ya rojane, çî ya dudirêj aniyê ziman. Li vir, ez tînim bîrê, ku gelek celeb stranên Kurdî yên din hene ku weke xwîna me ji me re girîng in. Pêwist e ku her mirovê xwedî hiş û hewn balê bidin ser wan û li ser wan lêkolîn û lêgerînan bikin. Ev lêkolîn û lêgerînen çand û wêjeya gelerî dibin bingeha avaniya pêşerojan. Bêgoman ev avaniya li ser van klasîkên pirr dewlemend wê pirr fêdê bidin.  
Ev fêde ji bo nişên pêşerojan karên giranbiha bidin. Lewra jî bilî kesan, sazî û dexgehên Kurdî pêwistî gavavêtinên fereh û girîng in. Malê gelê Kurd di nava lingên biyaniyan û hêrîşên dijwar yên nijadperestî de talan û wêran dibe.  
Pêşbirk û bendên ku di dema îro de, ne dereng, îro bêna danîn ji bo windabûn û têkçûnê wê rolek mezin bilîzin. Ku sazî û dezgehên me û herwiha hunermendên me û bi teybetî MED TV ku xwedî berpirsîyarî, bo gelê me nas bike, van dewlemendiyên çand û wêjeyî berhimbêz bike û bi nigariyek delalî bide.

BERHEMÊN MUZÎKA KURDÎ

Zozan OZMANIYAN

Tomarkirina her kaseteke dengbêjekî kurd yan jî komekê, ji bo kurdên li Ewropa dijîn bûyereke şadûmanî ye. Sedemên vê bextewariyê jî ev in:  
1. Nestaljiya bi welat û bi zimanê zikmakî ve ku dibe weke melhema li ser giyanên merov e.  
2. Muzîk di civata kurdî de xwedî cihekî teybetmend e. Bi wî awayî ku dibe cîgirê pêdiviyên huner. Herweha jî muzîk weke celebê yekemîn yê hunerê ku dikare bi dest bikeve tê hejmartin. Ev yeka ji sedema ku kurd bi awayekî awarte gelekî (miletêkî) awaz û ahenghez e.  
3. Di nav civaka kurdan de gelek dengbêj û awazçêker hene. Di van awaz û ahengan de hestên pêşbirk û rexnegêriyên xweş diyar dibin. Lewra jî hinde sitran cihekî xweyî nêzîk û navdar digirin. Herweha, hinde jî cihên xwe di dîrokê de digirin. Di dema îroyîn de, kaseteke nuh ya B. Botanî û komika wî ku li Swêdê tomar bû ye, ketiye destê guhdaran. Di vê kasetê de, "Hunername û dêvegerîn" B. Botanî weke sitrançêker xwe diyar dike û ezmûneyên wî yên folklorî baş diyar dibin. Di çar sitranên ku bi hev re diguncijin û ji ber bi karanîna enstrumentên wek hev, toneke teybetî distîne. Lewra jî ev her çar sitran bi hev re yekîtiyek harmonîk diafirînin.  
Di vê gotarê de em nikarin armanca salixdanê û lêkolîna hemî sitranên ku di kasetê de hene bînin ber çav û muzîk, ton û çiloyî ya bikaranîna enstrumentan şirove bikin. Ji ber ku her mijarek ji van mijaran dikare bibe babeteke lêkolîn û lêgerînen fireh û kûr.

AVAKIRÊ KURDISCH ROCK

CIWAN HACO

Dema meriv li muzîka kurdî ya 'modern' bifikire bê goman Ciwan Haco tê bîra meriv. Yekem kes û yekem car e ku wî muzîka kurdî ya gelemperî bi awayekî nuh û texlîtên cihê mîna blues, rock, jazz û hwd. bi kar aniyê.  
Ew di muzîka xwe de pirrengiyeke bi hosteyî bi kar tîne. Ew hem berhemên xwe û hem jî sitranên gelemperî, mîna 'ziravê' bi awayekî 'modern' û teybetî dibêje. Di her berhema wî de hesa kurdî, evîna Kurdistan û hêviyên pêşerojê hene. Heta niha wî şeş kasetên giranbiha amade kirine û her şeş jî di nava muzîka kurdî de xwedî ciyekî teybetî ne. Ciwan Haco, bi muzîka xwe ekoleke xweser di nava muzîka kurdî vekir. Di roja îro de gelek hunermend û komik ji muzîka wî îlhamê digrin.

Di vê hejmarê de em ê li ser dengbêj û hunermendên Kurd dirawestin. Daxwaza me ew e ku emê ne tenê hunermendên îro bi bîr bînin. Emê dengbêjê xwe yên kevin jî bînin bîra xwe. Di encamek lêgerînê û lêkolînê de, li ser wan rawestin. Dengbêj, berî ku alavên muzîkê peyda bibin, kolan bi kolan, gund bi gund, bajar bi bajar digeriyan û bi dengê xwe yên xurt û zelal, stranên Kurdî, yan li ser evînê, yan jî li ser tolê û mêraniyê ku di vê de namûs, xîret û rûmet heye, li ser bext û bêbextiyê bi rûhekî Kurdî distrandin.

Ev encam bûye bingeha huner û muzîka Kurdî. Îro muzîka Kurdî li cîhanê, tevî ku dewleta Kurdistan tune ye jî, bela bû ye û hatiye qebûl kirin, tê guhdarî kirin. Em kêfxweş in ku hunermendên mîna Şivan Perwer, Aramê Dikran, Ciwan Haco, Birader, Temo û hwd. ev bar danîne ser milên xwe, huner û muzîka Kurdî pêş ve dibin. Helbet kesên mîna mamosta Îkbal ku di hêla zanistîya kurdî de pispor e nayên jî bîr kirin. Bêgoman, li ser dengbêjan em dikarin pir tiştan bêjin û bînin ziman. Lê, em ê bêhtirîn li ser huner û jiyanê hunermendan, yeko yeko rawestin û her hejmar, yan jî di rûpelên xas de, bi armanca danasîna wan binivîsin

## MAHMUD KIZIL

Her mirovê Kurd ku pêwendiyên wî parîkî bi kurdîtiyê re hebe, bilî ku bi huner û muzîkê re têkil be, li dengê Mahmud Kizil gharî kiriye û navê wî dizane. Weke tê zanîn Mahmud Kizil jî herêma Amedê, qeza Farqînê ye. Di rêwingiya bi otobus û taksîyan jî gund û bajaran ew dengê bilindî tîr tewan dibihîst û gotin û galgalên şer û dîlokên evîndarî dibihîstin. Dengê Mahmud Kizil ne bes li kolan û çarçiyên Diyarbekrê berhimbêz dikirin. Li tevayîya Kurdistanê deng û awaza wî mêrê çê, di newal û deştên kur û dirêj û fereh de li hevûdin divegeriyan.

Mahmud Kizil, yekemîn hunermend e ku cara pêşîn di rojhilata navîn de sêlika stranên derxist. Ew sêlik jî, teji stranên kurdî bû. Nuzîka Kurdî berî ya gelek gelên din'bi derfetên modern dihate belavkirin. Bilî vê pîrr kasetên wî jî hatin weşandin.

Di sêlik û kasetên xwe de bi dengê teji ruhê kurdî, stran û dîlanên kurdî mal bi mal, kolan bi kolan, gund bi gund, bajar bi bajar gerand. Kê jî degê Mahmud Kizil ne bihîstiyê ku Koçero, Lawîkê Silîvî, ji Binya Xetê divegere bo heyfa destûbirakê xwe Şerîf, ji Eloyê xayin hilîne. Wî orf û adetên kurdî di vê stranê de jîndar kiriye. Namûs û şeref, bext û bêbextî, ruhê kurdî û xiyaneza kurdan straye. Strana uwaro...

Ew dengê xweş û bilind suwarê kurd li hespê suwar dîke û hêdî hêdî bi giranî û maqultî dide ajotin. Û dema ku Cembeliyê kurê Mîrê hekarî dilorîne dilê mirov jî nava sînema sînga mirov der dîke. Mahmud Kizil welatparêz e. Kurdhêz e. Lê doza welatê xwe, gelê xwe û herwiha doza feqîr û belengazan jî dilûcan xwedî derdikeve. Strana li ser Yusuf Azîzoxlî û dijminahiya dewleta Tirkan gotiye. Strana bi navê Melûlo li ser feqîran gotiye. Û herweha, ser kurdên rûhfirotî jî stra ye. Dema li ser milletvekiliyan distre ew wan sûcdar dîke.

Mahmud Kizilê 'Diyarbekrî', gelek stranên folklorîk yên govendan jî gotî ye. Nazewicim, ya herî xweş e. wî ev stran bi wî dengê xwe yê bilind û xweş nemir kiriye. Gelo ew roj wê bê ku çirayên mîna Mahmud Kizil, ji aliyê gelê me bi qedrê hêja, bêne nasîn û qedirkin.

Ronî, xortekî 23 salî ye û ji zarokên Hawarê ye. Yanî ji Tirbespiyê, hêla Başûrê Biçûk... Di sala 1988 an de rahiştiye tembûrê û dilê evîndarî, bi kul, mereza civakî, dengê xwe derxistiye û têlê dilerizîne.

**Agahdarî:** Tu çi cur muzîkê bikar tîne?

**Ronî:** Ez di warê muzîka nû de me ku di çarçeweya muzîka rojhilat de dimîne. Herwiha bi galgal û gotinên coxrafîk û dîrokî û hunandina civakî ya komeleyatî de gavan diavêjim û afirandinên xwe pêk tînim.

**Agahdarî:** Kîjan hunermendî tesîr li hunerê te kiriye?

**Ronî:** Apê min hinekî hozan bû, hinekî jî helbestvan bû. Heger ne di warê profesyonelî de be jî, ew dilêşiya bi sedsalan ku li ser serê komên xelkê yên Kurd mîna şûrê Demokles hatibû dalaqandin, bi dilzarî û dilxwînî dianî ziman, ne dinivîsî, nivîsîbane jî nikarîbû bide weşandin ku di berîk û kîsikên kevin û guvaştî de dihatin veşartin de man û teva wînda bûne bandorek mezin li ser min kir. Lê ew apê min di destpêka şerê 15 Tebaxê de bû gerilla û kete nava rêza şehîdên berxwedana îro, ez ajotim nava muzîkê. heya îro jî di bin bandora wî apê xwe de karê xwe dikim.

**Agahdarî:** Berhemên te hene?

**Ronî:** Kasetek min heye. Wekî din bi stran û awazên curbecur ez derdikevim şevan ku hejmara wan tîrî du - sê kasêtan dikin. helbet ji bo weşana kasetan jî derfetên aborî û teknîkî gerek in. Ku dewlet tune ye, zor û zehmetî ji bo hunermendan ku berhemên xwe biafirînin pîrr in.

**Agahdarî:** Tu muzîka xwe, bêhtirîn bi tembûrê pêk tîne yan jî grubek te heye ku alavên muzîkê yên curbecur pêk tîne?

**Ronî:** Baştire ku muzîk bi alavên dewlemend bête pêkanîn. Lê ji tune yî ez pîrraniya caran bi tembûrê tenê kar dikim. Di dilê min de heye ku bi solo gîtar, keman, akordîon, basgîtar û tembûrê bête afirandin. Helbet, bo vê pêkanîne derfet gerek in. Bê goman pêwîst e ku hunermend jî gavan biavêjin û derfetan derxin holê. Heya ku dikarîbin gavên fereh û mezin biavêjin û berhemên hêja derxin meydanê.

**Agahdarî:** Naveroka stranên te çi ye?

**Ronî:** Hesreta welat e. Evîna rastî ye. Qîrêna zarokan, lorandina jinan e. Hewara welat ya îro ye. Banga sibe ye. Karûbarê pêşerojê ye. Hêvî ye. Daxwaza gelê min e.

**Agahdarî:** Tu bi xwe, yanî bi hêz û himmeta xwe gihaye îro?

**Ronî:** Mixabin min nexwendiyê. Lê weke her zarokê Kurd ku dinava tevgerek û pîjiqandinek ne mirovanî de tevlihev dibe, penaber û koçber dibe, ji hêla jiyanê ve pingihayî me. Hem dil û hem mêjî... Di hunandina laşê her Kurdî de ev gihîştin heye. Lewra jî ez dibêjim ku pîrr tiştan dizanim.

**Agahdarî:** Pêwendiyên hunermendên Kurdistan çawa ne?

**Ronî:** Mixabin û bi dilekî şikestî dibêjim ku ne baş e. Bi rewşeke ne baş û çewt de dijîti heye ku ne karê kesên hunermend e. Lewra jî pêşketina mirovan û muzîkê çênabe. Hember ku dibîstan tune ne, bar dikevê ser milên me de. Mînak. Şivan derket, şoreşek di nava mûzîk û sitrana Kurdî de kir. Kî derket û xwest wî teqlîd bike û da pey şopa wî. Ev misrîti ye. Yan jî Tahsîn Taha... Muzîk û sitrana Kurdî jî gelek gelan zngîntir e. Lê dîsa em dibînin ku hin hunermendên me xwe dixin bin bandora Tirkî, Erebi û Farisî de. Gerek e em li ser lingên xwe rawestin. Em xwedî çand û dîrokeke mezin in. Divê em xwedî li wê derkevin. Her sitraneke kurdî dîrokek e. Jiyan e.

**Agahdarî:** Spas ji bo bersivên te.

**Ronî:** Spasî ji teref min...

## DEGBÊJ Û HUNERMEND DI JIYANA GELAN DE

Derwêş M. FERHO

Li cem hin gelan zagonên jiyane neniwîskî ne. Ne li ser kaxezan in. Li ti derekê ne qeydkirî ne. Lê hene. Gel, kom û kes li ser hîmê wê zagona ne nivîsî jîna xwe dimeşîne. Ew zagon ji aliyê pirraniya civakê bi awayekî giranbiha tê dîtîn. Ev gelên xwedî van zagonên ne nivîsî li hawîrdorê cîhanê xuya dikin. Li gor bîr û baweriya min ew gel jî bi çand û dîrokên xwe hîmê çand û dîrokên beşa din ya cîhanê teşkil dikin. Ew gel in ku kevntirîn gel li cîhanê ne. Ew gel in ku ji ber zagonên wan yên ne nivîsî zagonên nivîskî derketine. Ew gel in ku xwedî dîrokek in, xwedî çandeke zengîn in û bi pirranî bi awayekî gelekî dijwar girêdayê xwezayê ne. Hez ji tebîetê dikin. Hebûna wan, zagona jiyana wan di gelek waran de bi xwezayê ve yek kok e. Ango, zagona jiyane li gora şert û xwestekên tebîeta ew tê de amade kirine.

Indian, yan jî 'çermesor' li Amerîka Bakur, Amerîka Latîn, Bask li qeraxê Zeryaya Atlantîk ku niha di nav sînore Fransa û Spanya de ne. Bretûnî li Bretûnya (di nav Fransa de) û Kurd. Kesek şiphe nake ku Indian xwedî çandeke xwe ya teybetî ne. Heta niha jî dewletên weke Amerîka û Kanada nikarin ve çandê, vî gelê kevn bidin hunda kirin. Eger heta niha ev gelê xwedî dîrokek kevn li jiyane mayine, ji sedema çanda wan ya zengîn e. Bi xwezayê re bû ye yek. Di çîroka '**Lawîkê Dev Bi Ken**' de ev gel bi pirraniya zagonên jiyana xwe tê xuya kirin. Gelê Bask jî yek ji wan gelan e ku xwedî hebûne zengîn e. Çandeke zengîn û rengareng ji nava xwezaya vê herêma bedew der ketiye. Kesên herin nava welatên Baskan divê ku li şahiyêke bi navê '**Pastoral**' binêrin.

Bretûn û gelek gelên din li Ewropa, li Asya, û Afrîka hene ku meriv dikare wan di nav van kategoriyan de bibîne. Tiştê herî balkêş jî ew e ku hemî jiyana wan, hemî zagona jiyana wan di nav sitran û gotinên pêşiyar, mesele, çîrok, û serpêhatiyên wan de dibihurin. Heta bi dîroka wan jî pirraniya caran di nav van sitran, çîrok û serpêhatiyar de tê gotin. Zagona jiyane di nava vê çanda oral (ya devkî) de hatiye çarçewe kirin. Di nav van gelên xwedî dîrok û çandeke kevn de Kurd jî, bê goman, cîyekî gelekî girîng digirin. Jiyana Kurdan, dîroka Kurdan, çanda kurdan nehatiye nivîsîn. Bi sedsalan e ev hebûna bi rûmet û zengîn ji bav û kalan teslîmê zarokan bû ye û heta îro jî hatiye. Dîrok bi çîroka, bi sitranên 'mêraniyê', bi mesele û serpêhatiyar hatiye gotin. Bûyerên herêman, bi sitranan sedsalan e dijîn. Şerr û peymanên di navbera eşîr û êlên Kurdan û di navbera Kurd û xelkên din de di van çîrok û sitranan de hatine gotin û heta îro jî pirraniya wan tê gotin. Jiyana gel, evîna di navbera keç û xortan, di navbera meriv û xwezayê de, tirs û şahbûna rûhî di nav van sitran û çîrokan de têne gotin. Ahmedê Xanî di 'Mem û Zîn'ê de, Feqiyê Teyran di helbesta xwe de bi lawiran re 'axiftiye'. Evdalê Zeynê bi 'Quling' re û bê goman Çûkê Beytik di şerrê xwe de li hember Nebî Silêman de ev mînakên heja ne. Ev zagona xwezayî ku neniwîsî ye û di jiyana gelê Kurd de hê jî xurt e heta îro jî berdewam dike. Li herêmên ku hê şahredarî neketiyê, di nav komikên mitirb û qereçiyar de ev çand hê jî xurt e. Lê roj bi roj, eger Kurdên xwedî qelem lê xwedî der ne kevin û ne nivîsin, ber bi hunda bûnê diçin. Ev jî malxirabiyeke mezin e. Talan e. Xwekujî ye. Hunda kirina gelek tiştên ye ku xelas kirina wê dijwar e.

Divê ku meriv li ser dengbêjên xwe, li ser hunermendên xwe lêkolînen kûr bikê. Çîrokbêj jî dikevîna nava vê beşa hunermendan de.

Kawîs Axa û sitranên wî: Xalo, Şêx Seîd, Mamo û gelek sitranên din ku hêdî hêdî ber bi jibîrkirinê diçin.

Ayşe Şan û sitranên wê ku pirraniya me Kurdan nizanin ku ye û çî sitran gotine. Kirasê te meles e, Bavê Seyro, Mamir û hwd. ji dengê wê tene bîra kê?

Mihemed Arifê Cizrawî û berhemên wî mîna Xezal û Şêxa Dîne. Xifşê, Eman Koçerê, Kejê, Metrano, Eysan Elî, Evdalê û bi sedan sitranên din ku gotine.

Îsa Berwarî niha tê bîra çend kesan ku bi salan xizmet ji muzîka Kurdî re kirî ye. Çend kes dizanin ku wî bi salan Bûkê delalê, Helîmê û Geliyê Tiyara bi wî dengê bedew sitrandiye.

Meryem Xan? Gelo çend kes dizanin ku wê sitranên mî Girê Mira Bi Sîr e, Ez qumrî me û Gul Şên î gotî ye.

Mihemed Şêxo ku berî çend salan ji evîna welêt li dûriya welêt, di bin şertên penaberiyê de çû dilovaniyê? Cano dilo, Ev roj cejn e, Bar û Zorî, Şeva tarî, Sebrê, Meke gi Yarek min heye, Çerxa Felekê û hwd. sitranên wî bûn.

Garabetê Xaço û sitranên wî bi navê Siwaro, Lawîkê Metînî, Hekîmo û hwd.

Miradê Kinê, Hesên Cizrawî, Xelîlê Evdile, Şamilê Bek Mirazê Egît, Memê Silo, Şakiro, Mihemed Elîyê Mitirb Emero û Xidirkê Omerî. Bi sedan sitranbêjên mîna wan bo me nenas in.

Ev nav beşekî biçûk e ku niha meriv dikare bîra xw Bê goman, bi sedan kesên din hene ku her yekî xizmetek mezin ji çanda me re kirine.

Her kes dizanê ku dengbêjên her herêmê, her gundî, her eşîr û her êlê hebûn. Çîrokbêjên her herêm û eşîrê hebû Van tevan bi sedan, bi hezaran çîrok û sitranên Kurdî ku dikaribûn gelek penceran di nava dîrok û çanda me de ji me re ronak bikin.

Dema sitranek yan jî çîrokek dihate meydanê sedemeke wê hebû. Pirraniya van sitranbêj, yan jî dengbêjan, pirra van çîrokbêjan ew sedemê çêbûna wan sitran û çîrokan p baş dizanîn. Eger wan ew sedem nizanîbane ji wan re kêmasiyek mezin bû. Lewma wan sedemê hebûna her sit û çîrokê gelek caran di destpêk yan jî bi sitranê re bi çîro digotin ku guhdar babetê baş fahm bikin.

Karekî gelekî girîng û pêwîst e ku li ser van babetan, li se van dengbêj û çîrokbêjan, li ser van hunermendan û li se ozanên me, yên mirî û yên sax agahdariyên fereh û kûr bêne berhev kirin. Her sitraneke Kurdî, her şerrekî hatiy sitran, her çîrok yan serpêhatiyek bi serê xwe dîrokek e. Seyrê Xatûn li nav çend çandan heye? Evdalê Zeynikê, Şêx Senan, Edlê, Gewrê, Fatîma Salih Axa, Edûlê û Derwêşê Evdî, Lawîkê Metînî û bi sedan berhemên mîna wan di nav gelek çandan de nînin. Ev berhem ji aliyê gel me hatine pejirandin û heta roja îro hatine. Ev berhem n layiqê hundabûnê ne. Her yek ji wan dîrokek e û her yek wan operayek e. Ew jiyana in. Ew hebûna me ya gelempe ne. Ew ji rûhê gelekî weke gelê Kurd derketine.

Yên ku ew jî bi sitran û çîrokî heta îro jîndar kirine ne layiqê ji bîr kirinê ne. Divê ew yek bi yek, hem berhem hem yên ku ew sitrane û gotine bêne nasandin. Her îmka û her karîna divê ji bo vê yekê bê amade kirin. Tiştêk ji vê yekê girîngtir ji bo hêza qelemê nayê bîra min.

## LI SER HUNER Û KARÊ HUNER BI BRADER RE HEVPEYVÎN

**Agahdarî:** *Rewşa muzîka Kurdî ya îro çi ye?*

**Brader:** Beriya her tiştî ez spasiya xwe ji bo *agahdarî* diyar dikim û serkevtin dixwazim. Heger ez karibim bi van bersivan xwe dilopek xwîn bidim rehên dilê *agahdarî* û teybetî dilê xwendevanan ezê gelek bextiyar bivînim. Rewşa muzîka me wek her tiştê me bi rewşa gelê û welatê me ve girêdayî ye. Gava mirov bi fikrê gelê di dergûşa şariyataniyêta yekemîn de hatibe lorandin û mejandin helbet bingeha muzîka wî, çanda wî gelê gelekî xurt e. Lê mixabin ew gel, ji pêşîra wî welatî şîr û hingivê çand û muzîka tevî hevdu kiriyê û bi dilê xwe jê îstîfade kiribe, ji bindestiya salan, zilm û zorê ne hiştiye ew zarok ji çarpiya (çalepkê) pê ve bimeşe. Her gava xwestiye ku bimeşe, baz bide, zaliman xwe kirine yek û teppek li serê wî xistine û nehiştine li qada azadiyê dansa çand û wêje bike. Ev rewş diyar e ku hê jî berdewam e. Lê tevî vê rewşa xerab heger gelê me muzîka xwe li gorî cîhanê pêş ne xistibe jî, xwe parastiyê. Di cîhanê de gelek gelên di rewşa me de, ne tenê muzîka xwe, her tiştên xwe winda kirine. Du sedemên bingehîn hene ku muzîka me pê hatiye parastin

1/Muzîka me gelekî dewlemend e û mîrasek mezin e.  
2/Ji ber sedema ku nivîsandin qedexê bû û parastin zor bû, serhildanên me, destanên me, eşqa me, heya kar û barên rojane bi taswîra muzîkê hatiye pêçan û hunanîn. Di mêjiyê gel de hatiye çap kirin Ev jî bi rêya dengbêjan hatiye pêk hatin. Îro, hemî îmkanên teknîk ketine xizmeta muzîk û muzîkvanên me jî. ( cd, kaset, rojnamegerî û ya herî girîng û ber bi çav televizyon). Ger em karibin bi kar binîn, di demek kin de muzîka me wê gelekî pêş de biçê. Lê mixabin kesên me yên akademîk û teknîk gelekî kêmtir in. Ê ku hene jî ji ber gelek sedeman ji meydanê dûr in û nikarin nota yên xwe di dîlana dilan de bidin livandinê. Me hemuyan bi doxa tembûrê girtiye û ne me vê tembûrê, ne jî tembûrê me pêş de dibe. Tu li kujan hunermendê me dinêre, mîna min tembûrê di destan de ye û darbuqeyek li pey dixin dibe. Bi vî awayî muzîk belkî xwe biparêze, lê pêş nakeve. Bêhtir yoz dibe. Yanî xwe dúbare dibe. Bi teybetî li Ewropa civata me ya polîtîk gelekî xisarê dide muzîka me. Partî û rêxistinên me ji hunermendan siloganan dixwazin. Civatê jî bi vî awayî bi kar tînin. Ji ber vê jî, muzîk li ser bingehên hunerî û xalên nîgarî pêş nakeve. Kêmasiyên hunermendan jî çêbûne. Rêya hêsanî ji xwe re hilbijartine. Piştî xwe da ne dîwarê rêxistinan û li gorî demê meşîya ne. Helbet her hunermend weke her zarokê wî welatî di nava rêxistinê de cihê xwe bigire û ji polîtîka dur nekeve û rola xwe bilîze. Lê gerek rêxistin jî û hunermend jî karê hunermendî yê bingehîn ji bîr nekin. Karê hunermendî yê bingehîn huner e, hunermendî ye. Polîtîka, yan rêxistinî, heger çiqasî di xizmeta welatekî de be jî, bangî çînekî dibe. Lê huner bangî giştî dibe. Her kes nikare bibe sosyalîst, reformîst, demokrat, dîndar û hwd.

Lê her kes dikare evîndar, yan birîndar bibe. Polîtîka û huner di vir de ji hevûdin diqete. Stranek evîndarî, yan birîndarî di karê bangê de, wan navên jor teva bike. Ew nikarin bangê hev bikin. Ji ber ku daxwazên wan ne yek in. Lê, teva dikarin evîndar û birîndar bibin û karin li ser yek stranê guhdarî bikin. Heger hunermend karibe xwe bi hemiyar bide guhdar kirin, wê çaxê hunermendî ye. Huner ji bo daxwaza hemû kesî ye.

Lê rêxistinên weha na fikirin. Ger tu weke wan nebê û ne fikire, ger tu Evdalê Zeynikê be jî fêde nake. dengê te dengê qirikan e, tembûra te jî teneke ye. Ger rojekê ji te re taximek têl peyda kiribin, heta mirinê minetê li te dikin. Heger wan got çî û çî kirin te got: 'Erê', ger tu 'Nesê' be jî xem nake.

**Agahdarî:** *rewşa muzîka me û instrumentan. Çima pirranî tenê tembûr û teplîk, yanî derbeke?*

**Brader:** Ez bawer dikim min li jor bersiva vê pirsê da. Muzîka me bersiva hemû instrumentên rojane dide. Ez, ji tembûrê gelekî hes dikim. Lê ez dixwazim hinek stranên min bi saksafonê, hinek gîtarê temam bibin. Ev mîna keke ku didim... Lê kî wê ji min re alîkarî bike? Hem kêmasî heye, hem jî em her yek li derekê ne. Ev jî bi serê xwe sedemeke girîng e ji bo hunermend.

**Agahdarî:** *Hunermendên Kurd karin xwe bi hunerê xwe xwedî bikin? Hunera me û bazara hunera me çawa ye?*

**Brader:** Jiyana hemû hunermendên welata ya aborî, li ser piştî hunerê wan dimeşe. Gelek ji wan dewlemendê welatê xwe ne. Bazara hunera me tune ye. Di konferansa Akedemiya Kurdî ya 2 yemîn de min gelek tişt anîn ziman. Yek ji wan jî sedema bazara hunerî, yanî bazara muzîka me bû. Ev aliyê bazirganî û profesyonaliyê... Ger em, berhemên xwe weke hunermendên cîhanê ne weşînin û bela nekin, em nikarin pêş kevin. Bazara huner ji alîkî huner bela dibe, pêş de dibe, ji aliyên din jî hunermend dikare jiyana xwe ya aborî bimeşîne. Heya hunermend, 24 saetan li ser debora xwe û zarokên xwe yê rojane bifikire, nikare li ser berhemên bifikire. 'Sazê min heye, ger bişikihe, ezê yeke din ji kuderê peyda bikim?'. Gerek e hunermend nekevê nava dilêşîya wilo. Îro, jiyana hunermendên me ya roj bi roj e. Îro heye sibe tune ye. Salê carekê çend şevên Newrozê hene. Jê pê ve? Ew jî niv cê ne. Tu peran bixwaze, te şermezar dikin.

Dibêjin gelekî şerm e ku hunermendê Kurd peran ji bo şevan bixwazin. Lê dixwazin hunermendên Kurd, digel taşeronên Tirk, û teva jî ne dost, li bexçeyên xeyaran 15 saetan talîmê bikin. Ger tu ji min re bibêje 'were bexçe, heta êvarî xeyaran biçîne', tu bi çî mafî ji min re bêje 'li bexçe gulan mîna bilbilan bixwîne.'

**Agahdarî:** *Pêşeroj?...*

**Brader:** Berhemên min gelek in. Ez dixwazim CD çê bikim. Ger ez ser kevim, ez dixwazim hemî berhemên M. Şêxo û Mirado û hinek klasîkan li ser CD yan qeyd bikim ku tucarî ji holê ranebin.

Û ger mecal hebe ezê studyoyekê li Hollenda vekim ku hunermendên me yên bê derfet jê fêde bikin. Û dengên nû der bikevin holê.

Ji ber ku ez ji rewşa muzîka me ya pêşerojê, gelek bi hêvî me. Îro, ji doh, sibe wê ji îro çêtir be...



TOL

## ŞÊHRA DÊRSEYDÊ

Semseddîn Aslan

Berî ku em dest bi nivîsandina xwe û dabaşa mijara xwe bikin, bi kurtî dixwazim bêjim bê ŞÊHR çi ye?

ŞÊHR: Roja pîrozkirina avahî û cihên (warên) pîroz e. Gotinek Filehî (Suryanî) ye. Hemberê vê gotinê bi Kurdî ZÊW e. Di nivîsandinên xwe yê de emê li ser Zêwan jî rawestin. Ev tol bes di nava Kurdan de heye. Çi Misilman, çi Ezdahî, çi Fileh be... Bes li stana Kurdistanê ev roj hene û ji teref komên xelkê ve têne pîroz kirin.

Belê, Dema havîn dihat rojên ŞÊHR û ZÊWAN dest pê dikir. Bê derew, her goristan, her parezgeh û dêrên mezin teybetiyek wan hebû ku rojên wan hebûn di van rojên diyar de şahî û cejn dihat kirin.

Destpêka Havînê ŞÊHRA DÊRSEYDIKÊ li gundê HAXÊ, li hêla Torê, dest pê dikir. Dêrseydkê parezgeha Suryaniyan bû. Di wê rojê de tol di nava rengê olê de dihat ziman. Suryaniyên hemû welatan dihatin. Ji metropolan, ji Surî û ji Ewropa pîr kes dihatin wê Şêhrê. Dêrseydika Haxê, ji bo Suryaniyan cihekî taybet ku pîroz e digire. Pîroziya wê, li gorî olparêzê Mesihî, kevirekî pîroz ji Qudsê anîne û di bingeha wê de danîne. Lewra ev avanî bûye pîroz. Bi rastî roja şêhra Dêra Haxê rojêke dîrokî û çandî ye. Li ser vê yekê gelek tişt têne bîra mirov ku bîne ziman û di vî warî de bide xuya kirin. Roja Şêhrê, her kesî cil û kincên xwe yê paqij derdixistin û li xwe dikirin. Şal û Şapik, Kirasên bi uç û Qutikên bi neqşan xemilandî, Fîstanê ters bajarî û şarên romanî, rengo rengo li xwe dikirin. Kesk, sor û zer, spî û şîn tevî hevûdin dibûn. Ev nîgarî di govê û dîlanan de dibûn mîna qozeqerê. Lîle lîla jinan û fiqêna zarokêan di çû ezman. Rengo rengo bûn... Fileh, Misilman û Ezdahî...

Tevlîhev bûn. Keşe, mele û feqîr... Digotin em in rê û rêzanên xelkên xwe... Keşe, rehb, şamoşo û melfonoyên cil reş 'Gavano' çêdikirin. Keşe, rehb, şamoşo, û melfonowan, findik pê dixistin û rêz dibûn û li dora xwe dizivirîn, dibûne xelek. Mîna ayînekê dikirin lê geh bi Kurmancî, geh bi Filehî qewl digotin, hêvî ji xwedanê jorî dikirin. Helbet ev di nava komên xelkê de bi balkêşî dihat temaşê kirin. Lê herî kêfweşî û balkêş, li ber kemaçê, dahol û zirnê girtina govendê bû. Hunermendê ji xwerazî, xurt, yê kemaçê li kemaçê didan... Ew hunermendên ku bi navê mitirbî têne naskirin ku stûna çanda Kurdî ne û hê jî karê hunerîya xwe berdewam dikin kirasên hîzar li xwe dikirin û govend dirakirin lepan. Keç û xort, kal û ciwan, jin û mêr diketin milên hevûdin û dîlan dikirin. Ezdahîyan, filihan û misilmanan milê xwe didane hev û direqîşîn.

Xwarina wê şêhrê, ya bingehîn NÎSK bû. Dêrseydê her sê danê rojê, sibehî, nîvro, êvarî, nîsk dida wî qas xelkî.

Suwarê hespê kihêl diketin tiratê de. Dema suwaran xwe diberda meydanê her kesî li wan temaşê dikir. Suwarên jêhatî ji erdê yan wî rahêjê baqê nîskan, yan jî kalikên zebeşan...

Mixabin mîna her tiştî, ew tola rengîn ku di nava komên xelkê Kurd de şanêşahiyeke bû û mîna Zêwa Cûdî ku li serê çiyarêzan agir pê diket, ji teref dijmin ve hate qedexê kirin.

Heya îro jî ew qedexê berdewam e.

(Hejmara ku bê mijara me ZÊW in)

WEŞANDINA PIRTÛKÊN KURDÎ  
LI SOWYETISTANA BERÊ

Wezîrê EŞO

Piştî amadekirina alfabeya latînî sala 1929 ji bo Kurdên Sowyetistana berê dest bi weşandina pirtûkên Kurdî bû, li Ermenîstanê, Azerbeycanê û Turkmenîstanê. Lê, nava dereceya weşandina pirtûkên Kurdî de ferq, cudatî navbera van her sê welatan de hebû. Rast e, hejmara Kurdên Azerbeycanê û Turkmenîstanê ji ya Kurdên Ermenîstanê zêdetir bû, lê payê wan pirtûkan, yê pîre salên 30 li Ermenîstanê hatin weşandinê. Ferq û cudayek din jî hebû: Heger li Azerbeycanê û Turkmenîstanê her tenê pirtûkên dersan bo dibistanê bilî pirtûkên dersan wisa jî lîteratura pirtûkên edebiyatê, zanistî, politîkî, folklorî dihatin weşandinê. Eva bi saya çend dereca diqewimî. Ya pêşîn: Di Ermenîstanê de wê demê nivîskar û zanayên Kurdan pêşîn hatin ser zîn. Ewana şagirtên sêwîxanan bûn, yê ku di wan sêwîxanan de xwendin û bi saya wê yekê bîr û bawerîya netewiyê li ba wan pêş de hatin, çavên wan vebû. Li ser dîrok û qedera gelê wînda û wana biryar kir zanabûna xwe xerckin bo pêşdekirina xwendinê nav Kurdan de. Bo pêşdekirina edebiyat û medeniyeta Kurdî. Ya duduwan: Di vê derecê de wan rewşenbîrên Ermenî alîkarî da wan yê ku ji nava wan navçeyan penaber bûbûn. Li kuderê Kurd diman û bo vê yekê jî zimanê Kurdî weke yê zikmakî zanîbûn. Wan, yê ku rind hay ji qedera gelê Kurd û Ermenî, politîka Turkiyayê hindava wan de hebûn û ji gelê Kurd, ziman, erf û adet, xîreta Kurdî hes dikirin, biryar girtin zanabûna xwe di oxira medeniyeta Kurdî de li Ermenîstanê xerc bikin. Ji wan, rewşenbîrên Ermen, yê bi nav û deng Hiraçiya Koçar, Harûtiyan Mikirtîçyan, Rûben Dirampiyân, Bardan Pêtuyan piştgiriya ronekbîrên Kurdên pêşî kirin li Ermenîstanê. Wan ronekbîran, yê ku bûne bingehdara edebiyata Kurdî: Ereb Şemo, Cerdoyê Gêncî, Heciyê Cindî, Emînê Evdal, Casimê Celîl, Wezîrê Nadîrî, Ahmedê Mirazî û yê din... Bilî ronekbîrên Ermenî hikumeta Ermenîstanê jî piştgiriya ronekbîrên Kurd dikir, alîkariya bi her hêlî dida seba pêş de birina edebiyat û medeniyeta Kurdî, xasma çapkirina pirtûkên Kurdî. Serokê Ermenîstanê yê wî zemanî Axasî Xanciyan, merivekî Kurdhez bû, xemxwariya mezin hindava Kurdên Ermenîstanê de dihat kirin. Em ê di nîsara xwe ya ku bê de hurgulî şîrove bikin di derheqa weşandina pirtûkên Kurdî li wê komarê û komarên Azerbeycanê û Turkmenîstanê.

(dom dike)

## XEBATA PIRALÎ YA ENSTITUYA KURDÎ YA BRUKSELÊ

*Ev nivîsar di rojnameya 'De Standaard' de di bin navê "Kurd li Flanderen" hate weşandin. Vê rêzê çar rojan berdewam kir. Roja pêşin 'xebata pirralî ya Enstituya Brukselê' bû. Roja duyemîn li ser 'weşana MED-TV' bû. Roja sêyemîn jî li ser 'Parlementoya Kurdistan li Derveyê Welat' bû. Nivîsara dawîn jî li ser 'hebûna Komîteyên Kurdistan li Flanderen' bû. Em nivîsara li ser xebata Enstituyê ji zimanê Flamanî werdigerînin û ji we re diweşînin.*

'Kurd, bi awayekî giştî, li Tirkîyê şerrekî siyasî û leşkerî ji bo mafên xwe yê neteweyî didin. Herweha li Flanderen gelek Kurd û rêxistinên Kurdan xebata xwe di vê çarçewê de dikin. *De Standaard* çend rêxistinên Kurdî ziyaret kir: Enstituya Kurdî Ya Brukselê, Parlementoya Kurdî li Derveyê Welat û MED-TV li Denderleeuw. Resimê *Ehmedê Xanî* li salona mêhvanan ya *Enstituya Kurdî ya Brukselê* dineqîşîne. *Xanî*, bîrewer û şaîrekî ji Kurdistan e ku weke hîmdarê nasyonallîzma Kurdî tê qebûl kirin. Berhema wî *Mem û Zîn* di gelek aliyên de dişibê *Romeo û Julia* ya *Shakespear*. Derwêş Ferho dibêje "berhema wî ji *Romeo û Julia* baştir e, ji ber ku tiştêkî din zêde li cem çîroka evîndariyê heye: merivê di vê berhema de li evîndara xwe digere gelê Kurd (Mem) sîmbol dike ku li welatê xwe Kurdistan (Zîn) digere."

Serokê Enstituyê Ferho û çar xebatkarên (yek jê Flaman e) wê hene. Enstituya Kurdî ya Brukselê rêxistineke serbixwe û demokratîk e. Ew xebateke pirralî ya çanda Kurdî li Flanderen dike. Enstituya Kurdî ya Brukselê li Bonneelsstraat, bi alîkariya wezareta çandê xaniyek kirî. Ev xanî bi agahdariyê mezîna hate nuhkirin. Ferho dibêje ku "Enstituya Kurdî, bîr û baweriya wan çî be û ji ku bin, mala hemî kurdan e. Ew alîkariya civaka Kurdî li vî welatê dike ku ew bikaribin xwe entegre bikin. Bêyî ku ew şexsiyeta xwe ya Kurdî hunda bikin ew di nav civaka vî welatê de danûstendinên nêzik deynin. Ev jî tiştêkî mimkin e."

Li Flanderen di navbera pênc û heft hezar Kurd hene. Li Wallonie jî hew qas, li Bruksel kêmtir. Jimareke temam li ba me nîne. Ji sedema li Tirkîyê hebûna Kurdan di zagonê de hê jî înkâr dike. "Me ev pirs ji Balyozxana (ambasade) Tirkîyê kir. Bersiva wan ya dîplomatîk "agahdariya ku tu dixwaze li ba me nîne" bû. Ferho bawer dike ku di navbera heşt û deh ji sedî ji karkorên ji Tirkîyê hatine vî welatê Kurd in. Ferho dibêje ku deriyê Enstituyê, mala Kurdî, ji her Flamanê dixwaze bi Kurdan re hevnasîn bike û li ser wan agahdarî bixwaze re vekirîye. Enstitu kovareke mehane bi kurdî diweşîne, eynî kovar ewê bi zimanê Flamanî û Frensîzî jî di mehên pêş me de bêne weşandin. Ji bo kes û rêxistinên ku dixwazin jî bulteneke ji nivîsarên çapemeniya Flamanî û Frensîzî berhev dike û belav dike. Enstituya Kurdî ya Brukselê jî aliyê Wezareta Çandê weke saziyê hîmkirinê, ango xwendegheke bilind hatiye qebûl kirin. (Di nav rêxistinên biyaniyan de bes Enstitu ev qebûl stendiye.) Li gora şertên vî qebûl kirinê divê Enstitu her sal 3000 saet (rojê dike 9,5 saet) ders li ser babetên cihê, çandî, dîrokî, ziman, civakî û hwd. bide. Dersên zimanê Holandî qismekî girîng ji vî xebatê ye. Enstitu alîkariya penahandên kurdan, pîrrianiya wan ji Kurdistanê aliyê Tirkîyê ne, dike. Ferho, siyaseta Komîsariyeta Penahendeyan ku li hember penahendeyên Kurd dimeşîne ne rast dibîne. Pîrrianiya ku mafê penahendiyê heq dikin qebûl nabin. Gelek kesên ku nehatine

qebûl kirin û berepaş hatine şandin ketine girtîgehên Tirkîyan de. Paş havînê Enstituya Kurdî ya Brukselê hêvî dike hin projeyên din jî li Kurdistanê pêk bîne. (Ev çend sal e li Kurdistanê hin projeyên mezîna bi rêxistineke Beljîkî re pêk anîne.) Li hin gundan, eger mimkin bibe, amanca alîkariya dibistanan dikin. Hêvî ew e ku ew bikaribin li Kurdistanê xwendegehan di gundan de veke. Li gora îmkanan jî ewê cîhazên dibistanan ji vîra, bi alîkariya xwendeghekan Bejîka, bişînin wîra.

## Federalîzm

Enstituya Kurdî ya Brukselê sîstema federalîzma Beljîka ji bo xebata xwe weke bingehe qebûl kirî ye: li aliyê din yê Beljîka jî di bin eynî navî de li gora zagona aliyê Frensîzan xebata xwe dike. Ferho dîroka Beljîka baş nas kirîye. Ew dibêje "ji bo Kurdan di nav van şertan de xebat ne hêsa ye". Pêşeroja têkoşîna ji bo mafên Kurdan çawa dibîne? "Hêviya hemî Kurdan Kurdistanê mezîna û serbixwe ye." Ev Kurdistanê mezîna û serbixwe di nava sînorên Tirkîyê, Îran, Iraq û Suriyê de ye. Eqrê ewê deh caran weke Beljîka ye. Hin kes dibêjin 20 milyon, hin jî dibêjin 40 milyon Kurd hene. "Lê demokrasiyêke bi bingehe û rast, ku Kurd jî xwedî her mafê neteweyî bin, li Tirkîyê û welatên din ji bo me Kurdan gaveke pîrri mezîna û baş e. Modela Federalîzma Beljîka ji bo Kurdistanê tiştêkî gelekî giranbiha ye".

Peter DEJAEGHER

## agahdarî

Weşana	Berpirsiyar: Medenî FERHO	Navnîşan:	Nivîsar
Enstituya Kurdî	Redaksiyon: Kerîm BAQISTANÎ	Bonneelsstraat, 16 - 1210 Bruksel	berpirsiyarên
Ya Brukselê	Wezîrê EŞO - Ejder MEHEMED	Tel. 02. 230 89 30 - Fax 02. 231 00 97	nivîsên xwe ne